Bo Maçekê

Edîp Ebdila

Ew xewna atafa wê, nexşeyê diramanya ev çend sale li hêviyê, evîniya min di sînaryoya çend xelekî de, li ser ekranê hemû xwîn in, raçav bike di paşde birim.

Di paşde birim nav wî baxçê ew kubara ji dûr hatî. Heta evro min neşiya ji saloxetên wê xeber bidim.

Huner û ciwaniya wê kufr e ji dest min biçe! Yan dest lê bidim!

Guhişîm, çavên min dilovanî bi mêzekirina wê nebirin, dêmê wê yê xêrxazûk nexişîn û damayî, ez ev ê li himberî wî yê lalote bûyîm. Her zû hezên leyzîna mûzîkayek nîv şevî ser balgehek cot li bin sîbera pirça wê ya daviskî rast û çep dibûm. Mame xewte.

Da nivîsim, min nivîsa
Ax singê te çend kêle,
Tu çi dibêjî nekî qêjî.
Bes maçeke min bihêle,
Hêlma devê zalê berda, ez ev ê sinorbaz
Di zala zalgeha rê
Pêngavekê min neda rê

Hemû xewin dîtin,xewa min de dubare dibûn, lê vê carê armanc hingavt.

Çi guneh bû min hingavtî, ez hingavtîm?

Yêdî her şev li ser balgehê hero mêraniya min xir odên gerdonê kin cîhana filîşteya û cîhanên dî dozex dozex dihate sotin, miriys xira ez didîtim, min ew dîtin kirme mired.

Bo me mirîdê xewneka.
Adem girar Hewayê de kelî
Ez ji eşka maçekê de bûme delî.

Cejne û cejna bûn zarokekê sava, girnijîna dayîkeka xemûkî û cerk bire heza min a kesokî ket me kametê cihê pîlava de sekinî: sedan pirsên gumankirî kevanên birhên wê de peşîn.

Ez evê mandî di taqîkirina sifir standî min ne dizanî ev ew e û ya bûye êka din.